

## Mafên xwe nas bikin

Karkerên koçber û kesên xwedan vîza wekî hemû karkerên din li Avûstrlyayê xwedan maf in. Qanûn wan diparêze. Fair Work Ombudsman xizmeteke belaş pêşkêş dike, û dikare arîkariya we bike dema li Avûstrlyayê kar dikin mafê xwe têbigihîjin. Ew maf ev in:

- Diravê herî kêm ê ku tê dayîn
- Mercên din ên herî kêm li kar, wekî terikandin yan dema bêhnvedanê ser kar
- Parastinên ser kar, wekî mafê neketina ber nijadperestiyê

Hemû karsaz divê van qanûnan bişopînin. Wek mînak, ew nikarin ji qasa ku qanûnê diyar kiriye kêmtir dirêv bidin, hetanî eger karker bixwe jî qebûl bike.

Bo agahiyên li bara mafên cihê xwe yê kar, hûn dikarin serdana www.fairwork.gov.au bikin, yan bi 13 13 94 ji Fair Work Ombudsman re telfon bikin. Eger pêdiviya we bi wergêrê devkî heye, bi 13 14 50 ji Beşa Wergera Nivîskî û Devkî re telefon bikin.

**Bo agahiyên bêtir yan hevpirsîna neeşkere, ji kerema xwe bi Xaça Sor a Avûstrlyayê re pêwendiyê çêbikin.**


**T.** 03 9345 1800
**E.** national_stpp@redcross.org.au
**W.** redcross.org.au/workrighthub


*This Modern Slavery grant activity received grant funding from the Australian Government.*

KURDISH

Australian Red Cross



# Koletiya nûjen li Avûstrlyayê rûdide

Behre wergirtina giran li kar li Avûstrlyayê sûcekî giran e. Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin tê behre wergirtin, em dikarin arîkariya we bikin.

Hemû karkerên li Avûstrlyayê mafên wan ên bingehîn hene ku qanûn wan diparêze. Ev qanûn bo hemû karkeran e hetanî yên ji welatên derve, bêyî ku guh bide qasa mayîn an cûreya vîzaya wan li Avûstrlyayê.

**Divê li ser kar bi we re baş reftar bibe.**



**Koletiya nûjen** wê demê ye ku zordarî, gef an bêhêvîkirin bi kar were ku ji kesan behre were girtin û ew ji azadiyê bêpar bibin. Ev li Avûstrlyayê sûcên giran in û karê zorê, qaçaxa kesan, koletî û girêdana deyndariyê ne.

**Karê zorê** her kar e ku kesek bêyî dilê xwe yan bin gefa cezakirinê de bi zorê kar bike. **Qaçaxa kesan** wê demê ye ku kesekî bi kar bînin yan ji ber bêhêvîbûnê, gef yan zorê bo armanca behre wergirtinê veguhezin. Ev dikare di her pêşekariyê de pêk were wekî çandinî, mêvandarîtî, avahîsazî, paqijkarî û karê cinsî de be.

**Koledarî** wê demê ye ku kesek hîs dike azad nîne karê xwe rawestîne yan biterikîne, ji ber gef, zorbêjî yan bêhêvîtiyê; û kes bi awayekî berbiçav li qada jiyana derveyî kar ji azadiya ferdî bêpar e. **Koledariya hundir** li çarçoveya karê malê dibe, dema ku rewş û merc bi qasî karê wekî kolatiyê bin.

**Girêdana deyndariyê** wê demê ye ku xizmetên şexsî yên kesekî bi kar tên ku deynê wî were dayîn û deynê heyî yan idia dibe heye pirr zêde be, yan qasa karê ku kes dike ku deynê xwe bide beraqil nebe.

## Nîşaneyên behre wergirtinê

- Neçar bibin kar bikin
- Gelek saetan kar bikin bêyî ku bêhna xwe vedin
- Diravê kesekî rast nedin
- Diravekî deyn ê mezin bidin bo bikarhêner an karsazekî ji ber sefer, mayîn, cil û kinc, xwarin, çûyînhatin an belgeyên karkirinê
- Nikaribin cihê xwe yê karkirinê biterikînin an ser mercan gotûbêj bikin
- Li ser karî gef an tirs ser kesekî hebe, wekî bibêjin hûn ê bi paş ve werin vegerandin yan endamên malbatê dê ziyanê bibînin
- Nikaribin xwe bigihînin pasaporta xwe yan belgeyên din ên pênaseyê
- Nikaribin biçin doktor yan werin dermankirin

## Eger hûn li mala kesekî kar dikin, hin nîşaneyên behre wergirtinê jî hene:

- Tu caran an gelekî kêm caran bikarin bo delîlên şexsî ji malê derkevin
- Tenê bikarin bin çavdêriya karsazî malê biterikînin
- Nehêlin bi malbatê yan hevalan re pêwendî çêbibe
- Telefona we ji we wergirin
- We neçar bikin li cihekî hevbeş an nebaş razên û qet xwe negihînin cihê taybet
- Ji kesekî re gotinên nebaş, reftarên piçûkkirinê, destdirêjî yan tundî werin kirin
- Bêparbûna ji xewê û xwarinê tecrubekirin



## Arîkarî mimkin e

Xaça Sor hevpirsîn û piştevaniyê dike, û dikare bo arîkariyê we bişîne beşên din ên xizmetê. Xizmeta wergera devkî heye.

**Ji 03 9345 1800 re telefon bikin an e-name bikin bo national_stpp@redcross.org.au**

Herwiha **bernameyeke piştevaniyê** heye ku arîkariya gel dike jiyana xwe ji nû ve çêbikin. Ev bername arîkariya kesan dike ku cihekî ewle bo jiyanê peyda bike, piştevaniyê dike muqatebûnên bijîşkiyê, rawêjkarî û hevpirsîna hiqûqî û koçberiyê, piştevaniya malî hebin, bo perwerde û hînkirinê yan peydakirina kar, û têkiliyên civakî arîkariyê dide. Xaça Sor dikare li bara vê bernameyê agahiyên pirtir bide.

Wezareta Xizmetên Civakî li Bernameya Piştevaniya Kesên Qaçaxbûyî xercê vê xebatê dide.

Bo **hevpirsîna hiqûqîya belaş û neeşkere**, bi **02 9514 8115** ji Beşa Dijî Koledariyê ya Avûstrlyayê re telefon bikin yan ji **ASALegal@uts.edu.au re e--name bikin**.

Eger lezgîn be yan ser ewlehiya kesekî gef hebe bi **000** ji polîs re telefon bikin. Bo raporkirina mijareke ihtimalî ya koletiya nûjen bi **131 237** ji Polîsê Federal ê Avûstrlyayê re telefon bikin.

Eger rewş têkildarî zarokekê be dikare gerekbûna raporkirina pêwîst li gorî qanûna parastina zarokan hebe.